


Nijadperest, fêmînîzm
û sosyalîzmê weke du-
jminên xwe binav dikin

»»» R:7



Yekîtî û yekbûn dikare
bibe sedemê serkevtinê

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (402) 07-23-2021 Buha (1000) Tûmen

Bo lêvên zuha digirîn û
lêvên zuha dikujin

»»» R:6



Pêkvejiyan li welatên
pêkhatî ji netewe û olên
(cuda (Sûriya wekî mînak

»»» R:8



Şerê têhnîtiyê

Xelkê herêma Ehwezê di ro-
jên derbasbûyî de bi netirsane rijiyane ser şeqaman û dawî siloganên wan mirin û neman bo Komara Îslamî bûn; Ew meşe ku ji deştpeka heftiya berê ve wate roja Şemî 19'ê Pûşperê hebû. Ev bi sedema bê avî, daxistina deriyên avbendan û qutkirina bi zanebûn a ava rûbaran hatine ser şeqaman.

Ger xwenîşandan ji deştpeke ve bi awayê aram û li ser xwe û dût ji tundûtîjiyê bû, lê di dawiyê de xwenîşandan ber bi tundûtîjiyê ve çû û hêzên rejîmê bi gulle û batoman bersiva daxwazkariyên xelkê dan ku di encamê de heta niha aliyê kê 5 kes ji xwenîşanderan hatine kuştin û dehan kes jî birîndar bûne.

Li derheq rewşa avê di Îranê de, “Hemîdriza Canbazan”, Birêveberê Şirketa Av û Averoyê gotiye, di niha de li navbera 304 bajarên Îranê ku arîşeya bê aviyê hene, 101 bajar digel rewşa sor a bê aviyê rû bi rû ne. Pêka gotina wî, sala derbasbûyî ev gundên ku bi tankêran ava vexwarinê bo wan diçû 5



hezar û 500 gund bûn, lê îsal ev rêjeye bo 8 hezar gund bilind bûye Piraniya nerizayeti û bûyerên pêwendîdar di çend rojên derbasbûyî de li bajarên Xefaciye (Sûsengerd), Ehwez, Kerxe, Felahiye (Şadigan), Kût Ebdullah, Hemîdiye, Şûş û Ebadan (Abadan) qewimîne.

Piraniya aliyên siyasî li hember serkukirina xelkê nerazî yên Ehwezê ji aliyê rejîmê ve bertek nîşan dan ku yek ji wan Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê bû û ew kiryarên rejîmê şermezar kirine; Dezgeha Rêkxistina PDKÎ jî bi belavkirina tirakt û siloganên taybet, daxwaz ji xelkê kiriye ku piştevanîyê ji xwenîşandana El-ehwezê bikin. Her di vê derheqê de dewleta Amerîkayê nigeraniya xwe nîşan daye û ragihandiye ku em bi hûrî agehdarê bûyeran in û piştevanîyê ji mafê xwenîşanderan dikin.

Lê bilî berdetknîşandanan, eva ku cihê îşarepêkirinê ye, henekirina rêberên rejîmê ye; Elî Xamineyî, Rêberê rejîma serkutker ku di peyameke Îniştagramî de gotibû: “Erkê ser milê berpirsan e ku gengeşeya arîşeyên “Xûziştan”ê bikin!”

Yan Hesên Rûhanî dibêje: Hesaba xelkê “Xûziştan”ê digel ya deştayeke piçûk ku siloganan didin cuda ye!”. Ev axavtinane di halekê de ye ku tu bêjî ew kesên ku li ser şeqamên Ehwezê daxwaza deştpektirîn mafên xwe dikin ji welatek din ve anîbin û xelkê wê derê bi qewlê wî Xûziştanî nebin.

Eva ku di herêma El-ehwezê de derbas dibe di rastî de şerê têhnîtiyê ye! Beşek têhnîyê avê ne, beşek têhnîyê xwînê û beşek jî têhnîyê azadî ne! Xelkê asayî ku derfeta jiyanê ji wan hatiye şandin şer dikin bo vê ku bikarin avê bi deşt bixin û zîndî bimînin, Komara Îslamî jî bo wan deverane hêz veguhaştîye da ku têhnîtiya xwe bi xwîna lawên Ehwezê bişkîne û azadîxwaz jî ku salanik e li pey azadiyê ne û têhnîyê azadiyê ne di hewlê de ne da ku bi azadî rûbarên jiyanê xwe û nîfşa li pey xwe pir av bikin.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Salanik e ku sîstema koloniyalîstiya şovênîstî ya hakil li Tehranê, hewila vê yekê dide ku netewên zilimlêkirî di Îranê de wekî çavkaniya gef û metirsiyê bo ser ewlehî û yekparçeyiya destçêkirî ya xwe nîşan bide û wisa bide zanîn ku ger ev sîstema koloniyalîstî ya şovênîstîye nemîne û biherife, tev netewe di Îranê de ku bi “eqwam” binav dike, her yek ji wan ser bi welateke bihanî ne û bi pîlana wan Îran parçe û dabeş dibe.

Hem hikûmeta Pehlewî digot, hekî Şah nemîne Îran dibe Îraniştan, yanî bi herifîna Îranê, Îran parçe-parçe dibe, hem jî rejîma Xumeynî ku domkerê sîstema Pehlewî ye lê bi şaşikê ve piropagendeya vê dike û kiriye, her cure tevgereke netewên zilimlêkirî bi destçêkiriye dujminê Îranê binav dike û dibêje ger ev nîzame wate desthilata “Wilayeta Feqîh” nemîne, eva tev “eqwam” in ku bikirî-girtiyên Amerîka û Sehiyom-nîzmê ne û Îranê parçe-parçe dikin.

Ev piropagenanane heta aştêkê bandor li sre bîr û hizra hin ji Farsên ku bi qewl xwe bi azdîxwaz nas dikin, daniye, ku di beşên heştîyar de amadeya vê yekê nînin ku piştewaniyê ji mafê mirovî yên netewên bindest di Îranê de bikin û dibêjin ku metirsiya parçebûnê çavnihêriya Îranê dike!

Ev bîra koloniyalîstî ya şovênîstîye heta aştêkê berfireh bûye ku kesaneke wek Dariyûş Humayûn peyda bûne ku digotin, ger Komara Îslamî bikeve metirsiya herifîna û jinaçûnê, amade ne çekê hilbigrin û berevaniyê ji rejîma Xamineyî bikin!

Ew bixwe Îranê perçe dike

Dema ku rejîma Şah hate herifîn, Îran nebû bi ew Îraniştana ku metirsiyan bas jê dikirin û netewên nav Îranê jî cuda nebûn û ji vê aliyê dinê jî desthilateke tepesrekar ji Pehlewî xirabtir hate ser kar û hemû evên ku ji tîrsa parçebûna Îranê de bûn, piştî Komara Îslamî girtin û bo tawankirina rejîma xwe ya berê hêncet dianîn û bixwe jî kevtine ber tîxeya celadên Ceyranê û ger piştî mirinê zanîbin ku kevtibûne di nav çî xeyalekê de!

Çend roj e ku xelkê netewa Ereba Ehwazê, bi sedema tînbûnê û krîzên kelebûyî hatine ser şeqaman û hawara mafên xwe dikin, lê rejîm dúbare mijûlê belavkirina xeyala metirsiya parçebûna Îranê ye da ku rewatiyê bi tawan û kuştina Ereban di bajarên Erebnîşîn de bide! Lê ya ku bi kiryar di gorê de ye, eva ye ku Xamineyî û desthîlta wî ya qirêj, Îran parçe-parçe kirine. Ev sîstema koloniyalîstiya şovênîstî ye ku nan li Kurdiştanê biriye û av bi ser Ehwazê de daxîstîye û hejarî di Belûçîştanê de çandiye û bêhnkêşan bi ser Tirkemensehrayê de qut kiriye û sivikatiyê bi nasname û nîşanên Tirkên Azerî dike û bi kiryar mijûlê cudakirina netewên bindest di Îranê de ye.

Eva netewên bindest nînin ku Îranê parçe-parçe dikin, belkî kiryar û siyasî Xamineyî û bandên celad û gendelên wî ne ku netewên bindest neçar bi helwestê dikin, û neteweya Fars jî ger dixwaze bi azadî di Îranê de bijî, divê ji xeyal û wehmê bê derê û raştîyan bibîne, hekî ne paşeroj dê curek din bê şikilgirtin û ev hekî na bo sedan salên din di hesreta paşerojê de bijîn!

Yekîtî û yekbûn dikare bibe sedemê serkevtinê



N: Nûredîn Sofîzade

Di dîroka xebat û berxwedaniya rizgarîxwaziya gelê Kurd de, gelek caran sedemên sernekevtinê û şikestan, netebayî û netifaqiya di navbera hêz û aliyên nava tevgera Kurd de hatiye zanîn.

Hekî hemî pîlan û nexşên dumanan li hember gelê Kurd û bona şikeştêpêanîna şoreşa Kurd em berçav bigrin, hekî çî dujminê sundxwarî yê me ne, lê xalek di nava wan de heye ku divê em jê hîn bibin, ku ev jî yekbûn û yekdengî û yekpîlaniya di nava wan de ye li hember Kurdan. Hekî hikûmetên dagîrker ên Kurdistanê dehan arîşe û netebayî digel hevdu hebin, lê em hem dizanin ku dema tene ser pîrsa dijayetiya gelê Kurd, hemî yekdeng û hevpîlan in. Lewma ji berê ve gotine ku hekî mirov tiştekî baş ji dumanê xwe jî hîn be, her baş e.

Herçiqas mixabin Kurd û Kurdistan niha 4 perçe ye û li ser 4 welat û hikûmetên dagîrker de hatiye parvekirin, û bi berçavgirtina rewşa her kîjan ji wan perçên Kurdistanê û taybetmendiya gelê me û awayê serederiya her kîjan ji hikûmetên dagîrker, renga awayê xebat û mafxwazî û şoreşa Kurdan jî cudahî digel hevdu hebe, bêguman ev cudahiyane jî wisa dikin ku het yek ji wan perçên Kurdistanê taktîka teybet bixwe û gorî rewşa xwe bigire berahîka xwe. Hekî çî bi wan sedemên ku serve hatine baskirin, dikare taktîk û awayê xebatê ji hevdu cuda be, lê hemî netewa Kurd û tevgera rizgarîxwazane ye Kurd li her perçeyeke Kurdistanê dibe di

xala setratiya netewî de yekdeng û yekgirtî bin. Gelê me dikare zêdebarê cudahiya awayê xebata taybet bi perçeya ku tê de ye digel perçên dinê, aliyê kêrî divê li ser wan çend xalên girîng yekdeng û yeksetratiya bin. Xebat bona gihîştin bi mafê çarenivîsiya gelê Kurd, îcar li her şikl û sîstem û sitatoyekê de be, wekî serbixweyî, federalîzm, xudmuxtari, otonomî û... hwd.

Tevgera Kurd li her kîjan ji perçên Kurdistanê, dema ku hewce bizanin peywendî digel yek ji hikûmetên dagîrker ên Kurdistanê hebin, divê hêlêke sor di wê peywendiyê de hebin ku li ser xisargihanên û derbelêdan û danûstaniyan li ser berjewendiya tevgera perçeyeke dinê ya Kurdistanê nebe.

Ti yek ji hêz û aliyên siyasî û tevgera Kurd li yek ji perçên Kurdistanê, nabe dijayetî û şerê part û aliyên perçeyeke dinê ya Kurdistanê bikin, û şerê Kurd digel Kurd divê neyête kirin û ev yeka bi xirab û xwekujî û bi îxanet bête naskirin û bête şermezarkirin. Têvgerên Kurd li her 4 perçên Kurdistanê divê gorî derfet û îmkanan ne tenê dijayetiya hevdu nekin, hewce ye alîkariya hevdu bikin û piştevanê pîrsa netewî bin li her kîjan ji perçên dinê ên Kurdistanê.

Hewce ye netewa Kurd li her 4 perçên Kurdistanê hin xal û hêlên pîroz ên netewî biparêzin û xalên hevpar ên wan bin û bêguman ew xalên pîroz in ku dikarin zêdebarê cudahiya rewşa li her kîjan ji perçên Kurdistanê, yekîtiya netewî di nava 50 milyon Kurd de çê bikin. Wekî zimanê Kurdî, ala Kurdistanê û sirûda hevpar a netewî “Ey Reqîb”, navê pêşmerge, axa Kurdistanê, rojên hevpar ên netewî û nîştimanî, wekî roja şehîdan, roj û yada tevgeran û rêberan, û gelek xalên dinê ku hemî dikarin yekîtiya netewî çê bikin.

Dema ku li ser wî halî re jî mirov dîna xwe dide nava

her kîjan ji perçên Kurdistanê ku mixabin dujmin û dagîrkeran çendî caran Kurd û Kurdistan ji hev weqetandine û perçe kirine, mixabin li her kîjan ji wan perçane de jî hêz û aliyên nava tevgera Kurd arîşe û netebayî digel hevdu hene.

Li Bakurê Kurdistanê ku perça herî mezin ji cêstê Kurdistanê ye, mixabin heya niha yekîtî û yekarmancî û yekdengî di nava aliyên cuda yên siyasî de nîne û her kîjan bixwe cehdê dike ku hejmoniya xwe bisepîne û hebûna hêz û aliyên dinê bi rikeberê xwe dizanin, eva jî bûye sedemê vî yekê ku gelê Kurd dilsar be û setratiya yekê qahîm li piştserê xwe nebîne û bona berdewamiya jiyana xwe piştî xwe bi hikûmetê ve girêde.

Li Başûrê Kurdistanê ku nêzîkî dehik e hikûmet û deshilat bi hemî kêmasiyên birêveberiyê ve li deştê Kurdan de ye û hebûna dewleteke defakto be jî bûye cihê dilxweşî û hêviya hemî Kurdan li perçên dinê, lê mixabin em dibînin ku heya niha jî yekîtiyeke baş di navbera hêzên deshilatdar ên Başûr de nîne û eve jî bûye sedem ku keysê dujminan ji me bêt û bûye hegera xisar û jidestdana gelek deskevtan.

Li Rojavayê Kurdistanê piştî sala 2011an, parekî berçav ji axa wê perça Kurdistanê hate rizgarkirin, mixabin heya niha jî li ber nebûna setratiya yekê zelal a netewî û nebûna yekîtî û tebayiya nava hêz û aliyên siyasî, bi bêtî diyarîkirina şiklek ji çareseriya mafê netewî, qedera wê perçê zelal nîne û tenê mirov dikare bêtî Kurd deshilatdarên parekî ji navçên wê perçê ne û xudî ev deshilat Kurdan jî nefiya mafê netewî, Kurdistanîbûna wê perçê dike, û ew derfeta bo Kurdan hatî pêş, mixabin wê ji deştî diçe û ew hemî nirxa ku hatî danê, bêtî encam dimîne.

Li Rojhilatê Kurdistanê hekî çî seha netewî di nava gelê

me de gorî perçên dinê gelek serve ye û Kurd li wê para Kurdistanê gihîştine asta herî serve ya hişyariya netewî û gelek yekgirtî ne, û gelek xwedî heşt in ji bona piştevaniya hemî perçên dinê û dilê wan bo azadî û yekîtiya netewî lêdide, lê mixabin ew perçeya jî bêtî arîşe nîne. Hekî xalên erênî li Rojhilatê Kurdistanê ku xelk hilgîrê wan e, û me serve bas kirin, lê arîşa herî mezin ku di Rojhilatê Kurdistanê heye, wedigere ser natebayî û arîşên nava hêz û aliyên xebatkar ên siyasî, bêguman gelek caran ev yeka jî bûye sedemê dilsariya gelê me û jidestdana derfetên baş bo xebatê.

Gelek caran û li dîroka tevgera rizgarîxwaziya gelê me li Rojhilatê Kurdistanê de rikeberî hevdu qebûlnekirin û jihev cudabûn û weqetîyan û heta hin caran şerkirina di nava part û aliyên de, hatiye pêş.

Ger çî li derheq setratiya xebatê û xalên yekîtiya netewî li Rojhilatê Kurdistanê mirov dikare bi cur'et ve bibêje ku ji her perçeyeke dinê baştir e, lê mixabin tenê xwerazîbûn, deshilatxwazî, hevduqebûlnekirin, pêbendnebûn bi demokrasiyê wisa kiriye ku heya niha di nava her kîjan ji partiyê Rojhilatê de, çendî cudabûn çê bûne ku her hemiyan jî gorî xwe xisar gihandine tevgera gelê Kurd û bûne sedemê dilsariya gelê.

Niha bi keyfxweşî ve rengê hindê dide ku her hemiyan seh bi wan xisaran û şaşiyên kirine û ber bi yekîtî û yekgirtinê ve pêngavan diavêjin, bêtî ev yeka jî dibe sedemê hem dilxweşiya gelê me, hem dibe sedemê bihêzbûna xebatê, hem dikare dujmin ku heya niha bi perşûbelaviya nava mala Kurdan xwe serkevtî dizanî, bêtî hêvî û damayî bike, ku bêtî eva tenê yekîtî û yekrêzî û yekgirtina nava tevgerê ye ku dikare me ji armancên netewî ên me nêzîk bike.

Naveroka danûstandina Dr. Qasimlo digel dîplomat-terorîstên rejîma Îranê

Naveroka civîna di navbera nûnerên PDKÎ bi Serokatîya Dr. “Ebdulrehman Qasimlo” û nûnerên rejîma Îslamî bi Serokatîya terorîst “Ceifer Sehrarûdî” li Viyenê ku di rojnameya “Lomond” a Firansî çapa 1’ê li “January” a sala 1998’an de hatibû weşandin, ku “Dîlan Herdî” wergêrê ser şêwe zaraveyê Soranî kiriye.

Wergêrandin ji Soranî ve bo Kirmancî: Sîmîn Rûhanîzade

Pêka nivîsa rojnameya “Lomond”, nûnerên Komara Îslamî destpêkê bo civînê hatibûn, û merema wan çareserkirina pirsê Kurd nebû, lê “Qasimlo” li ser otonomî bo gelê Kurd neçû bin barê daxwazên rejîma Komara Îslamî, û lewma Komara Îslamî neçar bûn rêya terorê bigre bera xwe.

Deqa axavtinan

-Sehrarûdî: “Dem mijûle ji dest me diçe, bila em lezê bikin, spas bo we, em rêkev-tin ku ew civîne bi awayekî tevav nihênî di navbera me de bimîne, çimkî hin ji neyar û dijminên me naxwazin ew pirsgrêke bê çareserkirin, heta di nava hikumeta Îranê de jî hin kes hene ku bi dijî wê pêwendiyê ne. Di nava desthilata cîbicîkirinê de jî hêsan nîne bi rohnî bas ji wê pirsgrêkê bê kirin.

- Qasimlo bi raştevxwe diçe ser mijarê: Di heyamê du dîtînen me yên berê de bas ji du xalên bingehîn hate kirin, Pejirandina pîrensîpa otonomî (xudmuxtari) û pîrensîpa çalakîyên azad ên hizba me di nava welat de. We bersiv da ku karbideştên rejîmê razî nînin ku pîrensîpa otonomî yê bipejirînin. Xala duyem jî me ji mêj ve di deftera siyasî de bas jê kiriye, gelo kanê pêşmerge çeka xwe danê yn ne? Deftera Siyasî dibêje ku çek danîn îmkan nîne. Hûn dizanin ku piştî 10 salan şer kirin û ew hemû qurbanî dane otonomî bûye sembola xwaştê me. Em peyvek din bikar bînin? Ger

naveroka otonomî yê li cem we pesend be, bo çî hûn ji nav û peyva wê ditirsîn?

-Qasimlo li ser otonomî yê berdewam û pêdagir bû û bi huşdarî ve aliyê beranber bo danûsandinê gazî dikir: Nifşên me, nifşên demokirasî û otonomî yê ne: Bi alxayînî ve ger pîrsa Kurd çareser nebe, dê ber bi cudabûnê ve biçe...

Sehrarûdî diaxive: Eva yekem car e ku em di nav xwe de bas ji wê yekê dikin ku Îslamê bîr ji pirsgrêka netewan kiriye. Bo çareserkirina pirsgrêkan, em guh nadine kesê din, ne Rojhilat ne jî Rojava, em amade ne xwe bikine qurbanîyê îdiayên xwe.

Qasimlo carek din dest pê dike: Ez dixwazim bêjime we ku, ez razî nînim ji wan hemû aştengiyên ku we bo ragihandina otonomî çêkirine. Niha Xamineyî û Refsencanî li Tehranê nimêja roja Înê bi rê ve dibin, ew dikarin otonomîya Kurdistanê rabigihînin.

Qasimlo hûrdekariyên dîtingeha xwe li ser otonomiyê bas dike: Bo me 4 xalên bingehîn hene: Otonomî, wate parvebûna deselata navendî (décentralisation), xala bingehîn a duyem bo me Zimanê Kurdî ye, Zimanê Kurdî divê bibe zimanê fermî ê Herêma Kurdî. Xala sêyem diyarîkirina sînorên Kurdistanê otonomî ye, bo wê yekê divê fakterên cuxrafîyayî û aborî bîr jiberçavgirtin, li serveyê hemûyan, daxwaza hemû xelkê wan deverên ku Kurd têde dijîn. Xala çarem ku bo gelê Kurd girîng e, Divê aramî û asayîşa nava herêma Kurdî ji aliyê xwedî xelkê Kurd ve bê parastin, me daxwazên zêdetir nînin. Em li derheq cîbicîkirina wan, raştbîn in, bo mînak li derheq pîrsa sînoran dizanin ku pirsgrêkên piçûk hene, lê Kurd amade nîne bo tiştên piçûk şer bike.

Qasimlo encamgîriyê dike: Qet peyva otonomî yê nayê



guhrîn, wê peyve aliyêk derûnî û dîrokî bo xelkê Kurd heye û remze bo me, ez wisa hizir dikim ku naveroka wê li cem we pesend e, lê hûn dixwazin ku haşayê li xodî pyva wê bikin, dema ku hûn nivîseke pîroze Îslamî dixwînin, hûn nikarin bi bê “Bismîlah” destpê bikin, eva jî hemen tişt e, naveroka otonomiyê li cem we pesend e, lê “Bismîllah” ne.

Îranî dibêjin berê ku em danûsandinê xwe bidomînin divê em digel “Tehranê” pêwendiyê bigirin ku pêka gotinên wan hêviyek têde heye. Roja piştî hingê wate 13’ê “June” “Sehrarûdî” dibêje ku hatine li cem birayên xwe. We duh got ku karbideştên “Tehran”ê dikarin di nimêja roja Înê de bas ji otonomiyê bikin. Eva pirsgrêk e ku karbideşt û pêşnimêjen me bikarin digel xelkê biaxivin, lê ez rohtir bibêjim pirsgrêk eva ye ku dîtingeha me cuda ye.

Sehrarûdî bi êşkere mijarê ber bi aliyek din ve dibe û bi dîrûdirêjî bas ji çawahiya çareserkirin û nekirina pîrsan ji aliyê rejîmê ve dike: Helbet me pirsgrêkek din jî heye ku di wan deh salan de gotinên zêde li ser hatine kirin: Beşek dibêjin ku nabe kontrolkirina aboriya Îranê bigirine dest û xelkê hejar jî bibin bi hevvelatîyên pile

du. Wê demê ku “îmam” sax bû digot ku Îslam digel sermayedariyê de nîne, Îslam digel kontrolkirina dewletê de nîne, Îslam di nîvekê de ye û eva rêya sêyem e ku yaşayên xwe hene! Ez mînaka bazirganiya derve bo te bas dikim: Sê caran yasa bo meclîsê hatiye şandin lê çareser nebû...

Di dawiyê de neçar bûn bo kora diyarîkirina berjewendîya nîzamê bişînin... Bila em biçîne ser babeta otonomiyê, ew jî weke bazirganiyê ye: Du cur dîtingeh li ser hene, nêrînek ku li serdemê “Îmam Elî” tîne bîra mirov ku Îmam Elî li navenda xilafetê hikumet dikir, lê herêmek din jî hebû bi navê wilayet ku weliyê (Hakimê Wilayet) deselatek zêdetir û berfirehtir hebû ku li otonomîya îro de heye, mektebek din heye ku bibêje eva ye serdemê Îmam Elî bû.

îro rewş cuda ye em bi dijimin, û dora me ji aliyê welatên Nato û rejîmên beredayî ve hatiye girtin û ew rê nadin ku otonomî di çarçêveya xwe de bimîne, ew dixwazin ku berfirehtir bikin ku ber bi cudabûnê ve biçe, lewma otonomî pirsgrêkek nîne ku em bikarin bi yek an

»»»» Doma R:4

du car ragihandin di nimêja Înê de çareser bikin, pirsgerê-ka duyem Hizba Demokrat dixwaze ku rewîş mîna xwe bimîne û di heman demê de jî digel Komara Îslamî danûstandinê bike, lê ez alxahîn im ku ew yeka nayê pejirandin.

“Sehrarûdî” car din mijarê ber bi aliyek din dibe û bas ji karkirina sîstîma Komara Îslamî dike: Ez mînakêk din bo we bas bikim: Bo mînak peywendiyên derve. Ger me îro peywendiyên xwe digel Amerîkayê qut kiriye û digel Yekîtiya Soviyetê çê kiriye, biriyarek nîne ku di du rojan û bi du kesan hatibe danê, me civîn kirin û di dawiyê de piştî sê sal û deh sal û yanzde salan û bi berçavgirtina rewşa Yekîtiya Soviyetê, em gihiştine wê encamê ku me rêkevtin digel wan hebe, çima? Çimkî me pirsgerêka Efxaniştan û Pakîştan û kenda- vê û bi taybet digel arîşe digel Rojavayî yan jî arîşe heye, lewma divê li ser otonomiyê bi salan gotûbêj bê kirin. Ez ji vê yekê alxahîn im ku di rewşa niha de ew otonomiya ku hûn bas jê dikin qet nayê erêkirin.

Sehrarûdî dom axivtinê dide Hecî Mîstefewî yek ji endamên tîma terorê: Bi navê Xudê, Partiyên Komonîstî li ser bingeha tîoriya neteweyî a Stalîn hatine avakirin. Ere- b jî dibêjin, Eve jî dîtingeha me ye. Partiyên Sosyal De- mokratîk jî çareserên xwe hene. Li derheq hêzên Îslamî û Komara Îslamî, heta niha ti analîzek li derheq pirsgerîkên netewan nîne. Heger em wisa ji Komara Îslamî bikin ku ji rûyê tîorî ve bi awayekî micid û hûr bibine ser wê pirsgerêkê, serkevtinek mezin e. Helbet di Îslamê de sun- neta Pêxember û cêhgerên wî heye. Ez hîvîdar im ku rejîm balê bixe ser wê pirsgerîkê û li navbera sinet û eva ku hûn banghêjiyê bo dikin, tiştêkê di navbera herduka de peyda bikin...

Qasimlo dipeyve: Hûn dibêjin ku niha pirsgerêka binge- hîn, çaresera pirsgerîka otonomiyê nîne, belkî rêx- îstina peywendiya navbera Partiya Demokrat û Komara Îslamî ye. Em hatine ku dax- waza çareserîya pirsgerêka otonomiyê bikin. Eve dide xuyakirin ku mafê çarenivîsê çend cur in: Serxwebûn, Fe- dralî, Otonomî. Qasimlo ax- ivtina xwe didomîne û dibêje: Pirsyar eva ye ku erê gelo bi raştî Komara Îslamî hewcehî bi çareserkirina pirsgerîka



netewî li Îranê heye yan na? Me yê Kurd daxwaziyên herî kê- m hebûne. Me federalîzm jî qebûl e. Helbet bi raya min, wekî çawa Îslamê di dîroka xwe de hin curên federalîzmê hebûne. Gelek baş dibe ger federalîzm bê cîbicîkirin, bo mînak Yekîtiya Komarên Fedral yên Îranê bîn çêki- rin. Ku wisa bû ger hûn ne serxwebûn û ne federalîzmê û ne otonomiyê nepejirînin, nîşaneyê vê ye ku hûn nax- wazin pîrsa netewî çareser bikin.

Di dawiyê de: Belkî sibê beşek din ji Îranê daxwaza otonomiyê bike. Divê şiyana çareserîya pirsgerêkên navx- weyî yên Îranê ji rêya pîren- sîpan ve hebe, hin ji yasayan bo hemûyan, bo Ere- b, Belûç, Turkemen, Kurd. Heger ji îro ve ew pirsgerêke neyê çare- serkirin, di paşerojê de bo welat dê bibe bela.

Piştî civîneke kurt, herdu alî dema hevdîtinê bo dusibe diyarî dikin. Fazîl Resûl navbendçiyê Kurdê Îraqê, tê nav axavtinên wan û bo jihevne- zîkkirina herdu ali- yan dibêje: Yan ku hûnê bigihîjine rêkevtinekê û li ser gotûbêjan berde- wam bin û şer rawestînin, Yan emê berde- wamiyê bidne şer û dê gotûbêj jî berde- wam bin. Lê ya baş- t ev e ku hûn niha bigihîjine rêkevtinekê: Serde- meke guncaw e. Belkî di sê salên dinê de balansa hêzan û rewş cud be...

Ev dawî peyv bûn. Dengê kursî tê û paşê dengê teqan- dina çar gulleyên kêmdeng tê. Paşê jî hîç. Dema ku polîs ji aliyê cîranan ve tene age- hdarkirin ku Sehrarûdî xwe ew agehdar kiribûn û bixwe jî birîndar bû, termê 3 Kur-

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ serdana tirba şehîdên Viyenê kir

Roja Sêşermî 13ê Temûza 2021an, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Mîstefa Hicrî” li ba- jarê “Parîsê paytexta welatê Feransê di 32emîn salvegera şehîdkirina Dr. “Ebdulrehm- an Qasimlo” de serdana tirba şehîdên Viyenê li goriştana “Pêrlaşêz”ê kir.

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi danîna gul li ser tirba şehîdên “Viyen û Berlîn”ê ji aliyek soza xwe digel wan şehîdan nû kir ku rêbaza wan berde- wam e û ji aliyêke dinê ve, ew serdana nîşaneyek ji eme- gnasiya xwîna wan şehîdan e ku bi narewa hatine rijandin.

di rojeke wiha de 32 salan berî niha, karbideştên re- jîma terorîstperwere Ko-



mara Îslamiya Îranê li ser masê danûstandin bo aşitîyê, rêberên tevgera mafxwa- zaneya Rojhilatê Kurdistanê, nacamêrane şehîd kirin.

Berpîrsên dewleta Otrîşê, dîplomat-terorîstên Ko- mara Îslamiya Îranê bi bê ti lêpîrsîn û lipeyketinekê şandine Îranê.

Domderên rêbaza şehîd “Dr. Qasimlo”, hemû salan di wê rojê de bi çalakîyên siyasî, banghêjî û lidarxistina semînar, civîn û kombûnan nîşan didin ku ew şehîdane nayêne jibîrkirin û hêj wekî meşxelbideştên rêya azadiya Kurdistanê tene dîtin û rêz ji ked û xebata wan tene girtin.

Bo lêvên zuha digirîn û lêvên zuha dikujin



N: Serbest Urmiye

Berpirsiyarên rejîma Îranê di piropagendeyên olî yên xwe de, xwe weke nûnerên Xwedê li ser erd û pêşrewê mesebê Şî'e ku domderê rêya Îmam Husên in, didin zanîn. Li gor baweriya wan û ya hertim dibêjin ku divêt rûndikên xwînê bo werin rejandin, bizava qutkirina ava çemê Firatê ye (ya ku zanişt nade selimandin), li ser leşkerên Îmam Husên de û şehîdbûna wî û zarokên wî yên biçûk e bi lêvên zuha. Lê di sîstema Komara Îslamî ya Îranê de, ew hizir bi terzekê di bîr û raya alîgirên mesebê xwe de cih xistine ku ne tenê di civakê de, belkî di civînên Serkomar bi civata wezîrên welat re jî, rêûresmên girîng û tep li nava serê xwe xistîne di pêxema nîşandana rebeniya Îmam Husên û zarokên wî yên têhnî de, berdewam tînin lidarxistin.

Pirsiyar eva ye, gelo heke piştî derbasbûna 1400 salan bi ser bûyera han de, hêj hûn bo lêvên zuha yên şehîdên Kerbelayê li nava serê xwe dixin, lê xwesteka xelkê deşta Xûzîstanê, gelê ku ji netewe, regez û alîgirê Îmam Husên e, ji bilî qurtek ava vexwarinê çî ye ku bi lêvên zuha tînin kuştin?

Lêvên Xûzîstanê çima zuha ketin?

Sedem siyasîyên qirêj yên berpirsiyarên navendxwaz yên rejîma Îranê ne ku di pêxema avadankirina deşta bê vec ya navenda Îranê de, ji bilî talankirina dahat û xwezaya herêmên derdor, demeke dirêj e ku li ser navê parastin û berhingariyê li hember qeyrana çavkaniyên ava welat de, deşt avêtine lêdana bendavan û veguhaştina



avê bo navenda Îranê. Di vê derheqê de jî para pitir ber deşta Xûzîstanê ketiye. Xûzîstan ku ji bilî çavkaniyên binerd, bi hebûna Çemên Karûn, Kerxe, Diz, Cerahî û Hidîcanê xwediyê %33 ya ava sererdê ye û li gor gotina psporan bi hebûna dikare 2 milyon hiktare erd û çandiniyê têrav bike. Lê Havîna îsal di boriyên ava wan de, xwîna gerim a xortên wê cihê ava sar girt.

Helbet diziya avê mîratek e ku ji aliyê rejîma Pehlewî ve bo rejîma Îslamî maye. Sala 1332'an a Rojî, tûnêlek bi dirêjahiya 2841 metran di navbera çemê Karûn û Zayendrûdê de hate lêdan ku di her saniyeyekê de 30 metrên kûbîk ava çemê Karûnê diveguhêze Zayendrûdê û ber bi naveda Îranê ve tê şandin. Rejîma Îslamî jî di doma siyasîyên rejîma hilweşiyayî ya Pehlewî de, deşt avêtiye çekirina bendavên cur bi cur û rêya avê ji gelê herêma han girêdaye.

Nêzik 20 salan berî niha binav nûnerê Ehwazê yê Meclisa Îslamî ya rejîmê diziya deşthilatdarên Tehranê ji ava Xûzîstanê eşkere kir. Casim Şedîdzade, bi dengeke bilind dike hawar ku hûn bi miliyonan metrên kûbîk ji ava me vediguhêzin Kirman, Yezd, Qum û ev dibêje ku tûnêla "Kohreng 3" bi dirêjahiya 35 kîlometran, tûnêla "Çêşmêlengan" bi dirêjahiya 40 kîlometran û tûnêla "Qummihelat" bi dirêjahiya 70 heya 80 kîlometran, her sal bi çendînan miliyaran Tumenan xercê didin deştê hikûmetê ku ava me veguhêzin deştên we. Nûnerê Meclisê tîne ziman ku em dijberî dabînkirina ava vexwarina we ninin, lê ya ku hûn dikin siyasîyên e ku encama wê afrandîna qeyranên aborî, civakî û ... e, bo herêmên nişîv yên çemê Karûnê. Ya ku îro sîngê xelkê X]zîstanê bo qurtek ava vexwarinê dide hember guleyên hêzên leşkerî yên rejîmê.

Helbet ji bilî Xûzîstanê, di Kurdiştanê de jî rejîm ji bilî talankirina xweza û dahata binerd, ji mêj ve ye bi çekirina bendavan, ava Kurdiştanê talan dike. Ya xuya ye eva ye ku zû yan direng Kurdiştan jî dê bi lêvên xwe yên zuha derkeve hember boriya tivingên hêzên rejîmê.



Nerîna Lîderan



“Mesûd Barzanî”:

“Êrîşa terorîstî ya li Bexdayê, nişana bêwîcdanî û nemirovbûna terorîstan e”.



“Ned Price”:

“Em piştevaniyê ji mafê xelkê Îranê û xwenîşandanên wan dîkin”.



“Mulewî Xêyrullah Xêyrxah”:

“Hekî Tirkîye bixwaze di Efxaniştanê de bimîne emê dê mîna Amerîkayê digel wê şer bikin”.



“Hesên Rûhanî”:

“Hekî yasaya meclîsê nebaya tehrîmên ser Îranê dê beriya cejnê hatibana rakirin”.

Nijadperest, fêmînîzm û sosyalîzmê weke dujminên xwe binav dîkin



N: Eskender Ceiferî

Di 9-ê Çiriya 2019-an de, terorîstekî êrîşkar ê raştgir li Sachsen-Anhakta Almanê gulle berdan ser du kesan bi navên Jana L. û Kevin S. û di encamê de wan jiyana xwe ji deşt da. Bi giştî, wî hewl da ku 69 kesên din jî bikuje. Armanca wî ya yekem kenîseya civata Cihûyan a li Wasserturm li bajarê Halle Saale bû. 52 kesên ku bikuj dixwest li wê kinîştê bikuje, li wir karên xwe yên olî dikirin. Roja 9-ê Çiriya 2019 ji hêla Cihûyan ve wekî Yom Kippur dihat naskirin; Cejna herî bilind a salê ya Cihûyan e ku li kinîştê tê pîrozkirin. Bikuj agir berda derî lê nekarî xwe bigihîne kinîştê. Hevdem wî tîrorîstî, Jana. L. di kolanê de di demekê de kuşt ku wê dixwest bi wî terorîstî re biaxeve.

Sûcdar dev ji êrîşa li ser kenîseyê berda û berê xwe da Ludwig-Witcher-Straße. Di vîdyoyeke zindî de, wî diyar kir ku dixwest mirovên ku ew difikire koçber in, bikuje. Wî li xwaringeha Kiez jî zilamek bi navê Kevin. S. ku xwarin jê re dihat amadekirin, kuşt.

Nuha çalakvanên Almanî dibêjin tevî ku ew hatiye sizakirin jî, lê nabe bi ti awayekî dosye bê girtin.

Ew di 21-ê Çileyê Pêşîn a 2020-an de bi girtîgeha hertimî hate sizakirin; bi vî rengî divê ew heya hertim binçavkirî be.

Çalakvan didin xuyakirin ji bo parastina civakê, divê tim kar li ser vê dosyeyê bê kirin da ku nijadperestî berfireh nebe.

Kujer, nerînên raştgirane û tundrew hebûn. Wî nêrînek



raştgir a cîhanî hebû ku di qada civakê de ji ravekirinên derewîn pêk tê. Ew raman, weke faktorên afirandina kirîzê û metirsîdar tene hesabandin. Naskirina van ramanên bîrdozî yên raştgir ji bo dijatiya wan girîng e! Ji bo çalakiya li dijî bînpêkariyên mafên mirovan û berfirehbûna wan a civakî divê hevgirtîbûn hebe.

Çalakvan hertisa telezê dîkin ku civaka Alman bi newekhevî, pêşbaziyek ne tendurîst û valahiya nav civakê re rû bi rû ye. Ev ji ber pergala aborî ya kapîtalîst û pergala siyasî ya tîkildarî ve mijarê ye. Di demokrasîya parlamentoyê de, hêza biryara siyasî bi piranî bîyî bandora raştî a giştî ya civakê tê rêkûpêkkirin. Encam, newekheviya aborî û civakî ye; Ji ber ku li ser karûbarên aborî û civakî kontrola demokratîk tune ye.

Di nerînên cîhanî yên raştgirî yên terorîstê bajarê Halle Saale de, dijberiya Cihûyan, nijadperestî û dijatiya tevgerên jinan mijara sereke ye. Ramana tundrê ya raştgir hin beşên civakê mîna Cihû û koçberan, weke berpirsyarên nebûna ewlehiyê û mercên dijwar ên jiyane binav dike. Li gor vê ramana raştgirî, bi cudakariya nijadî û dûrxistina nijadên din, rasgir dikarin ji bo xwe, dabînkirina çavkaniyên civakî, dahat, xanî û mercên jiyane yên baş misoger bikin. Li gor îdeolojiya nijadperestiyê, ew li vir di rewşeke nebaş de derbas dîkin, raştî tepisandin û mer-

cên jiyane yên dijwar tî.

Ew, dijatiya Cihûyan, newekhevî, û pêşbaziyek ne tendurîst wekî encama bernameyên veşartî yên civaka veşartî dibînin. Li şûna ku pergala civakî ji gîlî û gazincên heyî re tawanbar bikin, ew fikirin ku ji ber kiryarên hin kesên raştî ve rewşê hatine. Ev demek dirêj e ku fikra ku Cihû hêza xwe ya veşartî bikar tînin, heye. Bîrdozîya dijberê Cihûyan bû sedema kuştina bi milyonan Cihûyan ji hêla Sosyalîzma Netewî ya Alman ve, ya ku di dema Hîtlêr de di bin biryara wî de pêk hat û hîn jî berfireh e.

Di heman demê de dijberên Cihûyan ramaneke raştgirane hene ku li gor nerîna wan, Cihûyan fêmînîzm û sosyalîzm dahênane. Ew, van ramanan bikar tînin da ku hêza xwe deştînan bikin û nîrxên kevneşopî di civakê de tune bikin. Fêmînîzm wekî tevgerê azadiyê nayê deştînkirin, lê ji hêla raştgiran ve wekî sedemek ji bo tîkdana hevgirtina civakê tê dîtin. Dijberên fêmînîzmê dixwazin dewletekê bîdomînî an vegerînin ku zîlam tê de serdest in.

Ew di dawîya daxuyaniya xwe de herwisa dibêjin: Em di vê baweriyê de ne ku divê darizandina êrîşa raştgirî ya 9-ê Çiriya bi bidawîbûna darizandinê re bi dawî nebe. Ew gotûbêjek civakî ya bi bîrdozîya kujer û mercên civakî ye ku vê gengaz dike.

Pêkvejiyan li welatên pêkhatî ji netewe û olên cuda (Sûriya wekî mînak)



N: Mîstafa Oso

Pirrengiya olî û fireneteweyî, rewşek xwezayî ye ku di piraniya civakên serdem yê welatên cîhanê de dihête dîtin, ji ber ku ti dewletek ji aliyê etnîkî yan jî hêla olî ve safî û petî nîne, Ev yek dibe bibe sedemek ji bo bihêzbûn û dewlemendiya dewletê û bibe sedema mezinbûn, pêşkeftin, xêr û xweşiya wê - wekî Amerîkayê û dewletên rojavayî yê Ewropa- yan jî bibe faktoriyeke lewazbûn û paşkeftina wê, û sedema peydabûna hevrikî û perçebûna wê- wekî dewletên Sovyeta berê, dewletên Balkanê û hin dewletên din di dehsalên dawiyê yê sed sala bîstana de û hejmarek dewletên Rojhilata Navîn, di nav de Sûriya niha jî - li gor siyaseta li hember wê tê pejirandin, û şewekarên serederiya li gel û çareserkirina wê û sînorên hez û vîna ji bo pêkanîna pêkvejiyan û xweşbûnê di navbera van pêkhatayan û movikên tevna civakê de yê dewletê.

Pêkvejiyana di navbera pêkhatayan netewî û olî de, pêdivî bi gelek hewildanên gerantor ji bo peydakirina jîngehek li ser bingeha têkilî û lihevhatinê di navbêna wan de û bi pejirandin û qebûlkirina cudahiyan li ser bingeha naskirina maf û erkan û rêzgirtina yekdu, bi dîtina xalên hevbeş di navbera hemû pêkhatayan de heye, herwisa pêdivî bi şikandina zihniyet û hizra li ser bingeha pûçkirin, dûrxistin û bêparkirina ji maf û derbirîna ji xwe heye, tevî ku pêdivî bi boçûn û lêrînek zelal ji bo îro û siberojê heye, bi asoyên mirovî li ser binemayên zagon û yasa û peymanên navnetewî yê girêdayî mafên mirovan, di destûr û makezagona dewletê de bi awayê ku paraştin û



pêkeftina wê misoger bike, hokar û faktorên ewlehî, aramî û aştiyê peyda bike.

Ji ber girîngiya mijara pirs-girêkên pêkvejiyanê di nav pêkhatayan cur bi cur û cuda de yê civakên dewletên cîhanê û karvedanên wê yê raşterast li ser pirs-girêkên aşti û ewlehiya navnetewî, ku civaka navnetewî û Netewên Yekbûyî, herdem xema vê yekê dixwin û li ser pêdagiriyê di gelek yasa, biryar û belgeyan xwe de û herwisa di bîranîn û helkeftên xwe yê têkildar de dikin, wekî: Roja Lêborîna Navnetewî, ku her sal dikeve di 16ê Çiriya paşîn de, û Roja Navnetewî ya Pirrengiya Çandî ji bo Diyalog û Pêşkeftinê, ku her sal dikeve 21ê Gulanê de.

Li Sûriyê, ku welatekî naskirî ye bi zehfî û pirrengiya xwe ya netewî, olî, mezhebî ve..., ku pêkvejiyan di navbera pêkhatayan wê de raştî gelek destdirêjî û xirabiyan hatiye, û herweha raştî gelek derbên bi êş hatiye, ku tede stûn û bingehe wê ji hêla hemû hukûmetên deştilatdar hatine hejandin, ji ber polîtîkayên wan yê nijadperestî û kiryarên tundutijiyê, tepeserî, paşguhixistin, înkâr, dûrxistin û perawîzkirinê..., pêşgirtina li xwederbirîn û bêparkirina ji mafan. Piştî hilatina şoreşa Sûrî di adar 2011 de, û peydabûna komên çete yê Îslamî yê tundrê, ku siyaseta û kiryarên wan di vî warî de ji siyaseta û kiryarên wan ji aliyê nijadperestiyê, olperestî û tawanbariyê ve ji kiryarên

hemû hukûmetên Sûrî yê ku deştilatdarî heta niha xirabtirîn, ... ku bandorên xirabtir xistine li ser mijarên pêkvejiyîna civakî di navbera pêkhatayan wê de, heta radeyekê ku zengilê metirsiyê li ser encamên pir xirab li ser mijarên ewlehî, aramî û aştiyê lê dide.. ku tikes nikare encam û bertek û dorhêla wan ya metirsîdar pêşbînî bike.

Bideştixistina pêkvejiyaneke daxwazkirî di navbera pêkhatayan netewî û olî yê civaka Sûrî de, heta astekî mezin bi xebatek bêtir û hewldanên hemû hemwelatî û saziyan wê yê cur bi cur heye - nemaze malbat, perwerde, ol û civaka sîvîl - ji bo binbirkirina hizra û ramana û şûnwar û bermayên siyaseta û kiryarên zordestî, înkâr, perawîzkirin, dûrxistin û bêparkirinê, yê ku di qonaxên borî de hatine komkirin di mejî û zihniyeta wan de, û divê xebatek bibe li xema çespendina prensîb û nîrxên mirovî ji bo xurtkirin û bihêzkirina pêkvejiyanê, herwisa peydakirina jîngeheke baş ji bo wê ku mafên mirovan û azadiyan bingehe misoger bike, ku pêwîstiya vê yekê bi xwe bi garantiyan destûrî û yasayî heye ku wan biparêze û pêşve bibe, û pêkanîna dad û wekheviyê di navbera hemû pêkhatayan de misoger bike, bêtir cudahî û cudahiyeke li ser bingeha netewî, yan olî yan jî mezhebî.



Projeya talara çandî ya bajarê Sinê piştî 18 salan bi dawî nehatiye

Projeya talara navendî ya bajarê Sineyê di sala 1382an a Rojî de dest pêkir, lê piştî 18 salan hêj bi tenê qewareya wê hatiye çêkirin û bi nîveyî maye.

Talara navendî ya bajarê Sineyê li sala 1338an wekî talara çandî mifah jê werdigirtin, lê di sala 1382an de hatibû hilweşandin ku bi îdiaya berpîrsên parêzgehê mezintir û berfirehtir ava bikin, lê ew proje 18 sal e ku her bi nîveyî maye û ne berpîrsên parêzgehê pêdegirî li ser avakirina wê dîkin û ne rejîma Îranê bûdceya avakirîna wê dabîn dike.

Ew projeye bi berpanatiya 14 hezar û 500 metra 2cî hatiye avakirin ku biryar bû 5 qat hebin û 2 salonê cuda ên sînema, tiyatro û mûzîkê têde hebin.

Parêzgarê Sinê “Behmen Muradnîya” di Havîna sala derbasbûyî de soza bi dawîanîna wê projê dabû ku di çend mehan de bê encamdan ku nehate cîbicîkirin.



Herwisa di vê derheqê de, Serokê Giştî yê Çand û Îrşada Îslam li parêzgeha Sinê, “Ubeydullah Roştî” got: “Projeya talara navendî ya Sinê niha ji %68 hatiye cîbicîkirin û bona bi dawîhatina wê projê hewcehî bi 118 milyar Tumenî heye”.

Rejîma Îranê tevî dijayetîkirin digel çanda xelkê Rojhilatê Kurdistanê, derfetên heyî jî, ji nav dibe.

Ciwanek di nav avbenda Sîlwanayê de xendiqî

Roja Pêncşemî 16ê Temûzê, ciwanek di avbenda Sîlwana ya girêdayê bajarê Urmîyê de xendiqî û piştî rojekê termê wî ciwanî hate peydakirin û herwisa nûciwanek 16 salî li Bokanê di nav avê de xendiqiye

Pêka nûçeyên nefermî ên navxweyê parêzgeha Urmîyê, ciwanekî xelkê parêzgeha Tewrêzê ku temenê wî 27 salî ye li avbenda Silwanayê de xendiqiye û heta niha nasnameya wî kesî rohn nebûye û herwisa nûciwanekî 16 salî xelkê Bokanê li dema xweavdanê li navbera pompaja ava Seqîz û gundê “Qelage”yê xendiqiye.

Xweavdan di ava avbendan de gelek metirsîdar e û renga avjenên bi hêz jî nekarin ji metirsiyên ava avbenda xwe rizgar bikin û dibe xelk haydarê wan metirsiyan bin.



Pêka amaran heta niha 64 kes di avbenda Sîlwanayê de xendiqîne û berpîrsên parêzgehê tevî agehdarbûn ji rewşa metirsîdar a wê avbendê ti kes an kesaneke bona rizgarkirina xelkê li wê avbendê de erkdar nekiriye û ti binke an navendek ava nekirine.

Agir berbûye dariştanên Bozîn û Merexêlê

Bexşdarê Bayînganê “Mi-hemedhadî Zamyad” daye zanîn ku ji roja Çarşemiyê ve agirberbûye dariştanên devera Bozîn û Merexêlê û ew berfirehtir dibe.

Bexşdarê Bayînganê “Mi-hemedhadî Zamyad” îdia kiriye ku ew agirpêketin li sînorê Herêma Kurdistanê dest pêkiriye û hewl bona temirandina wî agirî berde-wam e. Lê pêka nûçeyên belavbûyê ew agir hêj berde-wam e û bi tenê beşeke kêma ya wî agirî ji aliyê parêzerên jîngeh û kesên xwebexş ve hatiye temirandin û di hin cihan de her agirpêketin berde-wam e û berfirehtir dibe.

Rejîma Îranê tevî hebûna helikopter û balafira temîrandina agir heta niha ti pêngavek bona temirandina wî agirî hilnegirtiye û bi sedema asêbûna devera çiyayî li hin cihan, xelkê nekariye wan



agiran bitemirînin û hewcehî bi helikopter an balafira temirandina agir heye.

Devera çiyayî ya dariştanên “Bozîn û Merexêl”, bi berfirehiya 23 hezar û 724 hîktar e ku di sînorê navbera Pawê û Herêma Kurdistanê de ye.

Sala derbasbûyî 3 jîngehparêz ên bi navên “Muxtar Xendanî, Yasîn Kerîmî û Bîlal Emînî” li hewladan bo temirandina agir di devera “Bozîn û Merexêl”ê de şehîd bûn.

Werzişvanekî Kurd li Almaniyayê bi alaya Kurdistanê beşdarî li kêbirkêyan de kir

Penaberê siyasî û xelkê bajarê Mihabadê yê bi navê “Daniyal Aqayî” di kêbirkêyekê de li welatê Almaniyayê serkevtin bideşt anî.

Ew kêbirkêye li bajarê Berlîn ê li Almaniyayê, bi beşdariya çendîn werzişnvanan ji welatên cîhanê bi rê ve çû bû.

Ew werzişvanê Kurd li werzişa “MMA” karî yarîzanê rikeberê xwe ku werzişvanekî xelkê “Le-histan-Polend”ê bû raştî



şikeştê bike û serkevtinê bi deşt xwe ve bîne.

Pêştir Biryar bû ku “Daniyal

Aqayî” bi alaya Almaniyayê di wê kêbirkêyê de beşdar bibe lê navbirî gotibû ku ez dê bi alaya Kurdistanê beşdariyê bikim, lewma alaya Kurdistanê wekî alayeke fermî di wê kibirkêyê de hatiye pesendkirin.

Navbirî xelata xwe pêşkêş bi xelkê Rojhilatê Kurdistanê kir.

Daniyal Aqayî werzişvanê beşa hunerên şer, li sala 1382an de li bajarê Mihabadê ji dayîk bibû û bi sedema wê yekê ku malbata wî siyasî bûn, bi neçarî bajarê xwe bi cih hiştin û çûne almaniyayê.

Daniyal heyamê 6 salan e ku werzişa “MMA”yê dike û heta niha çendîn serkevtin bi deşt xwe ve anîne.

Navbirî xwedî birvanameya “Niqumvanî ” ye.

Zanyariyên nû li ser jiyana Dr. Nûredîn Zaza

Hevjîna rewşenbîr û siyasîmedarê Kurd Dr. Nûredîn Zaza, Gilberte Favre di pirtûka xwe de cih daye hin zanyariyên nû derbarê hevjinê xwe de.


Hevjîna Dr. Nûredîn Zaza yê koçkirî û rojnamevan û nivîskar Gilberte Favre semînarek taybet bi îmzekirina pirtûka xwe ya nû û çapa sêyem a bîrweriyên Dr. Nûredîn Zaza birêve bir.

Dîmenên taybet ên semînerê ji bo Rûdawê hatin şandin. Herwiha Xatûn Gilberte Favre Zaza ji Rûdawê re derbarê herdu pirtûkan de axivî.

Li bajarê Sionê yê Siwîserayê, Gilberte Favre, rojnamevan û nivîskar û hevjinê Dr. Nûredîn Zaza yê koçkirî, yekemîn serokê yekem partîya Rojavayê Kurdistanê semînarek pêşkêş kir.

Semînar taybet bû bi îmzekirin û pêşandana pirtûka wê ya nû li jêr sernavê “Rêrewek Li Gel Rimbaud û Nameyek bo Philippe Rahmy” ku di beşeke wê de hin zanyariyên ku bo yekemîn car tên belavkirin derbarê Dr. Nûredîn Zaza û pirsê Kurd de hene.

Di semînarê de, her wiha çapa nû ku çapa sêyemîn e ya Pirtûka bîrweriyên Dr. Nûredîn Zaza, Jiyanameya Min a Kurdî hat nîşandan, ku kurê wî yê nixurî Şengo di



nava projeyekê de ji bo çapkirina berhemên bavê xwe weşandiye.

Dîmenên taybet ên semînarê ji bo Tora Medyayî ya Rûdawê hatin şandin. Herwiha Xatûn Gilberte Favre Zaza ji Rûdawê re derbarê pirtûka xwe ya nû de axivî.

Nivîskar û rojnamevan Gilberte Favre Zaza dibêje: “Di dema petayê de min ew beş biserî kir, paşê jî min bi Nameyekê bo Philippe Rahmy, temam kir ku nivîskarekî Siwîserî ye, bavê wî fransî-Misrî ye û Misilman e, û diya wî Elman e û Cihû ye. Vê yekê hişt ku pir hişvekirî be. Lê mixabin ew mir, ew bi nexweşiya tenikbûna heştiyan ketibû. Wî tekstên pir ciwan û bedew nivîsandine.”

Gilberte Favre Zaza ji Rûdawê re her wiha behsa çapa sêyemîn a bîrweriyên rehmetiyê Dr.Nûredîn Zaza kir.

Gilberte Favre Zaza herwiha dibêje: “Ev sêyemîn çapa Jiyanameya Min a Kurdî ye. Ev deşt pêşxeriyê ke kurê me ye, Şengo wî ew dubare êdîte kiriye û weşînerê pirtûkên min ji 25 salan ve, lê vegeriyaye û form û grafikên wê dariştine. Min jî careke din ew xwend û di bin çavan re bir, û me not û nîşe li jêr rûpelan zêde kirin li şûna ku li dawîya pirtûkê bin. Bi vî şêweyî hat temamkirin, û min jî tiştêkî bisûd lê zêde kir, ew jî kronolojî ye.”

Gilberte Favre ji temenê 12 saliyê ve deşt bi nivîsandinê kiribû, û di temenê 15 saliyê de deşt bi weşanê kiribû. Bi dehan pirtûkên wê di biwarên şano, helbest û rexnekariyê de hene. Niha ew ligel kurê xwe yê takane Şengo Zaza li Siwîsrayê dijî. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Du girtî li girtîgeha bajarê Urmiyê hatine îdamkirin

Pêka nûçeyên belavbûyî, sibêdeha roja Yekşemî 27`ê Pûşerê, cezaya îdamkirina du girtiyan ku berê bi tohmata “kuştina bi zanebûn” bi îdamkirinê hatibûne cezakirin, li girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hate cîbicîkirin.

Nûçegihaniya “Hêrana”yê nasnameya wan du girtiyan bi navên “Babek Eslanî” û “Muhsin Îsfehanî” ragihandiye, ku li roja Înê 25`ê Pûşperê bo cîbicîkirina cezaya xwe bo odeyên takekesî ya girtîgeha bajarê Urmiyê hatibûne veguhaştin.

Pêka rapora Nûçegihaniya Hêranayê, girtiyekî din ê bi navê “Mêysem Sadiqî” Ku hevdem digel wan du girtiyan bo cîbicîkirina cezaya îdamkirinê, bo odeya takekesî hatibû veguhaştin bi lêbihûrîna malbata kesê ku hatibû kuştin, bo benda girtîgehê hatiye veguhaştin.

Cîbicîkirina hukmê cezaya wan du girtiyan heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji aliyê ragihandinên navxwe û herwisa çavkaniyên fermî ve nehatiye ragihandin.

Qedera welatiyekî xelkê bajarê Urmiyê piştî binçavkirinê hêj nexuya ye

Qedera welatiyekî Kurd yê bi navê “Emîn Îranîzade” Kurê Nasir û xelkê gundê “Qasimlo” ê ser bi bajarê Urmiyê, piştî binçavkirinê hêj nexuya ye.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, tevî lipeyketina malbata wî welatiyê Kurd bo navendên ewlehî, hêzên ewlehî ji bersivdaneke seraşt li derheq qeder û rewşa giştî ya navbirî xwe diparêzin.

Herwisa wê çavkaniyê eva jî daye zanîn: “Emîn Îranîzade” di heyama binçavkirina xwe de ji “deştêregihîştin bi parêzer” û “hevdiştin digel malbata xwe” hatiye bêparkirin.

Roja Duşemî 14`ê Pûşperê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ew welatiye binçav kirin û navbirî bo lêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî li bajarê Urmiyê veguhaştine.

Heya dema belavkirina vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser “Emîn Îranîzade” hatiye sepandin, ti zaniyariyek ji ber deşt de nîne.

Du kolberên Kurd ên bajarê Pîranşarê hatine birîndarkirin

Pêka nûçeya ku Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê belav kiriye, “roja Çarşemî 23`ê Pûşperê, kolberekî Kurd ê bi navê “Mûsa Zîbapûr” xelkê bajarê Pîranşarê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên rejîma Îranê, li ser sînorê “Maşkan” ê wî bajarî hate birîndarkirin.

“Kurdpa”yê daye zanîn, hêzên leşkerî yên rejîmê bi bê agehdarkirina berê bi awayê raşteraşt ew kolbere dabûne ber gulleyan.

“Mûsa Zîbapûr” bo çareseriya pizîşkî bo navenda dermanî ya bajarê Pîranşarê hatiye veguhaştin.

Herwisa Ajansa “Kurdpa”yê belav kiriye, şeva Sêşemî 22`ê Pûşperê, kolberekî Kurd ê bi navê “Seyîd Rewan Têso” kurê Kemal û xelkê bajarê Pîranşarê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên rejîma Îranê li ser sînorê “Birwêşkan” yê ser bi bajarê Baneyê hate birîndarkirin.

Ji bajarê Urmiyê welatiyekî Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Yekşemî 20`ê Pûşperê, li bajarê Urmiyê welatiyekî Kurd ê bi navê “Şêrzad Şoqî Qasimlo” kurê Xalîd û xelkê gundê “Mam Îbrahîm” ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Hêzên ewlehî ew welatiyê Kurd bi bê hebûna ti belgeyek yasayî binçav kirine.

Heya niha lipeyketinên malbata “Şêrzad Şoqî Qasimlo” bo agehdarbûn ji qedera kurê xwe bê encam mane.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedem û tohmata ku bi ser navbirî de hatî sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt nîne.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (402)



*Wî nedihêşt xem bimîne
Tirs nehiştibû
Di meydana şer de li ser lêvên zarokan ken diafirand*



Dezgeha Ragihandina Giştî ya PDK